



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 6

Şîrovekirina Nameyên Padîşahê Mîttanî Tûşratta bo Fer'ewn Amûnhûteb

Me di lêkolînên derbasbûyî da hin beş ji nameyên padîşahê Mîttanî *Tûşrattayê Duwem* ji Fer'ewnê Misirê *Amûnhûtebê Sêhem* ra anîbûn ziman. Niha jî hin serinc û şîrovekirin ji wan nameyan ra.

Serinca Yekem: Nameyên "Mîttanî-Misirî" ku hatine belavkirin, tenha ew name ne, yên ku ji padîşahên Mîttanî da ji Fer'ewnan ra hatine şandin. Em di nav wan da ti nameyan nabînin ku ji Fer'ewn da ji padîşahên Mîttanî ra hatine şandin. Ev diyarde ne li gor rastî û xwerisk, ûrf û adetên dîplomasî ye. Adet berê wisa bû û niha jî wisa ye ku gava rêberê welatekî - çî di rewşên şer û çî di rewşên aştiyê da - nameyekê ji rêberê welatekî din ra dişîne, li ser wê bersiv tê şandin.

Di nameyên *Tûşratta* da ji *Amûnhûteb* ra belge hene ku Fer'ewn şandek bi rêberiya misiriyekî bi navê *Manî* dişande *Waşşûkanî*, paytextê Mîttaniyan û arezûya Fer'ewn digihande *Tûşratta* ku ew dixwaze bi mîreka Mîttanî ra bizewice. Ma gelo tê aqilan ku Fer'ewn bi *Manî* ra nameyan neşîne û vê daxwaza xwe têda nenivîsîne?. Dîroknas Wilhelm Gernut derbarê zavatiya navbera *Tûşratta* û *Amûnhûteb* da gotiye: "**Ev zavatî piştî hevt salan pêkhat, yanê piştî pir gengeşiyên dirêj**"¹. Gelo tê aqilan ku ev doza hevt salan kişandiye bêtî nameyên Fer'ewn ji padîşahê Mîttanî ra be?

Bê guman, wê pir name ji Fer'ewn da ji padîşahên Mîttanî ra hebin. Sedema tinebûna wan di jêderan da ewe ku yan hemû name xirab bûne (şikiyane, wendabûne), ev jî îmkaneka pir dûre. Yan jî hene, lê nehatine wergerandin û belavkirin. Heger wisa be, ev bixwe jî mijareka pir balkêşe. Bê guman, belavkirina van nameyan wê pir ronahiyê bide ser rewşa siyasî ya Rojhilata Navîn di wê demê da.

Serinca Duwem: Ji nameyên ku hatine belavkirin, tê xuyakirin ku Fer'ewnan dixwastin bi mîrejinên Mîttaniyan ra bizewicin. Em di jêderan da nabînin ku padîshahekî Mîttaniyan xwastiye bi mîrejineka misirî ra bizewice, yan jî bi mîrejineka misirî ra zewiciye. Gelo ev çawa tê şîrovekirin?

Belkî sedem ew be ku Misiriyên kevnar bawerdikirin ku xwedayê bala "Rah" (xwedayê rojê) kurê xwe kiriye padîşahê Misirê û Fer'ewn hemû ji tov û neslê wî ne. Ji lew ra, Fer'ewn lexema "Kurê Rah" standiye. Ji ber wê Fer'ewnan nedixwastin xwîşkên xwe, keçên xwe û her mîrejineka ji malbata padîşahî bi padîshahekî yan mîrekî ne misirî ra bizewice². Bê guman, padîşahên Mîttaniyan ev baweriya ayînî li ba Misiriyan dizanîn û ji lew ra nexwastine ku tiştekî wisa ji Fer'ewnan bixwazin ku li dijî ayîna misirî ye û pêkanîna wê daxwazê ne gengaze.

Serinca Sêhem: Zewaca Fer'ewnan bi mîrejinên Mîttaniyan ra sê nifşan kişandiye û hin caran Fer'ewnek bi du mîrejinên Mîttaniyan ra zewiciye. Wek nimûne, *Amûnhûtebê Sêhem* bi xwîşka *Tûşrattayê Duwem* ra zewiciye û di pey ra bi keça wî ra jî. Heger armanc ji van zewicandinan tenha siyasî bûya, hîngê zewaca bi yek mîrejineka Mîttanî ra bes bû. Em bawer dikin ku zewaca Fer'ewnan bi pir mîrejinên Mîttaniyan ra bi gelemperî vedigere ser bedewî û zîbahiya wan û teybetmendiya wanî çej, demîn û sinciyên şaristanî û bilind. *Tûşratta* di nameya xwe da, derbarê keça xwe, vê yekê piştrast dike û dibêje: "**Min jinek da birayê xwe, ya ku wê dilê wî tijî şahî bike**"³.

Hêjayî gotinê ye ku em bêjin, Misiriyên resen (esîl) miletekî afrîkî ne û rengê cermê wan tarî ye. Li ba wan rengê gewr û çîl taybetmendiyeke bedewî û xweşikayiyê ye. Wisa tê xuyakirin ku jinên Horiyan bi bedewiya xwe navdar bûne; bi taybetî jî bi rengê gewr û çîl. Heya niha jî ev şeweyê bedewî û spehîtiyê di nav Kurdan da pir heye. Ji lew ra, ne dîrî aqilane ku taybetmendiya "horiye, hîoriye" di çanda erebî da ku tê maneya "qeşeng" û "ferîştên bihuştê" ji taybetmendiya wan jinên Horiyan hatibe birin.

Serinca Çarem: Wisa tê xuyakirin ku *Tûşratta* ji kûraniya baweriyê da bi xwedayên Horiyan bawer bû ku ew dikarin mirovan ji nexwaşiyên sax bikin û xwedayên Horiyan ne tenha ji gelê xwe hezdikin, ew bi gelên din ra jî dilovan û mihirvanin; ew li gelên din jî xwedî derdikevin û wan jî ji nexwaşiyên saxdikin gava ji bo wan pêwîst be. Ji ber wê, *Tûşratta* xwedaya Horiyan *Şawûşka* (*Shawushka*) dişîne Misirê daku Fer'ewn *Amûnhûteb* ji nexwaşiyeka ku pêketibû sax bike. *Şawûşka* mezina xwedayên Horiyan bû; ew xwedaya evîndarî û cengê bû. Navê xwedaya Mêzopotamiya "Eştar" avêtibûn ser wê⁴.

Ji hêla din va, ji nameyên *Tûşratta* tê xuyakirin ku ew pir rêz û hurmetê ji mezinê xwedayê Misiriyan "*Amûn*" (xwedayê rojê) ra digire û wî bi awayê "**serwerê min**" bi navdike. Armanca wî ji hinartina *Şawûşka* ra ne ku here

dijberiya "Amûn" bike yan jî nirxa wî kêmkir bike. Helbet, her gelek xwedayê xwe li gor çanda xwe, bîreweriya xwe û dîtina xwe ji jîyan û hebûnê ra bi taybetmendiyan dibîne. Helwesta *Tûşratta* tê wê maneyê ku gelê Horî di warê ayînî da vekirî, nerm û mêşin bû, û ne bi awayekî dijminane li xwedayên gelên din temaşê dikirin. Ev dîtina vekirî û nerm di hemû heyamên dîroka Kurdistan da aşkera û diyare. Mirovê Kurd di warê ayînî da ne serhişk û êrişbaze; taybetmendiya wisa paşê ji ayînen dervayî civaka Kurdistanê hatine nav Kurdistan.

Serinca Pêncem: *Tûşratta* di peyvên xwe da ji bo Fer'ewn pir nazik û mêşine; ew peyvên dostane û ne fermî bi kar tîne (**birayê min, dostê min, zavayê minî ku ez pir jê hezdikim**) û dixwaze ku Fer'ewn, malbata wî, malmezinên wan, hesp û erebeyên wan yê şer di saxî û selametiya da bin. Pir gengaze ku Mîttaniyan bi hesp û erebeyên şer alîkariya leşkerê misirî dikirin, ji ber ku di wî warî da Horî navdar bûn. Ji Horiyan kesekî bi navê "Kikkuli" jî tê naskirin ku siwar û erebeyên şer yê Hitîtan jî perwerde dikirin⁵.

Ev awayê nivîsandina ne fermî û pir nerm di navbera *Tûşratta* û Fer'ewnan da pir dostane bûye û *Tûşratta* xwastiye ku ew peywendî berdewam bibe, daku hevpeymana wan yan siyasî di navbera *Padîşahiya Mîttanî* û *Padîşahiya Misirê* da her bimîne û xurt bibe. Da ku ew bi vî awayî careka din li ser Sûriyayê nekevin şer û pevçûnan û ji hêla din va *Padîşahiya Misirê* ya xurt ji wî ra piştgir be li dijî êrişên padîşahên Hitîtan. Ji ber ku di wê demê da Hitîtan li her delîve û fersendekê digeriyan ku *Padîşahiya Mîttanî* talan û dagîr bikin.

Serinca Şeşem: *Tûşratta*, di nameyên xwe da, wisa tê xuyakirin ku ew ji aştîyê hezdike; di nameya xwe da hêvî dike ku ti dijminên wî tine bin. Lê helbet dide xuyakirin ku ewê her êrişeka li ser welatê wî û li ser Misirê jî paşva vegeîne. Ew dibêje: "Welatê me di aştîyê da dijî. Ez hêvîdarim ku ti dijminên birayê min jî tine bin. Lê heger dijminek bi ser welatê wî da hat, bila min agahdar bike. Hîngê seranserê welatê Horiyan, çek û cebilxaneyên me, ji bo vegeandina êrişa dijmin, wê tekevin xizmeta birayê min. Ji hêla din va, heger dijminekî min hebe - ez hêvîdarim ku tine be - ezê birayê xwe agahdar bikim û hîngê birayê min jî wê welatê Misirê, çek û cebilxane û tiştên din ku li ba dostê min hene têxe xizmeta min"⁶.

Ev şewazê aştîyane di piraniya heyamên dîroka Kurdistan û pêşiyên wan da serdare û neteweya Kurd di piraniya heyamên dîroka xwe da neteweyeka ku di ber xwe da berevanî dikir bû; berxwedêr bû, û ne neteweyeka talankar, êrişbaz û dagîrkar bû. Û heya roja îro jî wisa ye.

Serinca Heftem: *Tûşratta* ji Fer'ewn zêrinî pir dixwaze û vê daxwaza xwe dubare dike. Di wê demê da Misirê zêr di kanên welatê Nûbe derdixist. *Tûşratta* bi jîrekî ji Fer'ewn dixwaze ku ew peykerekî ji zêr ji ber keça xwe va ji wî ra

bişîne û peykerekî din ji aç (şîrmahî) jî⁷. Wilhelm Gernut dibêje: "**Tikaya Tûşratta** ku dubare dike ji wî ra pir zêrî bişîne nîşana wê yekê ye ku dixwast li welatê Horiyan goreka ji zêr (bi horî gereşk) ji bapîrê xwe *Artattamayê Yekem* ra avabike. Ev baldariya wî bi pêşiyên malbata xwe vedigere ser wê yekê ku ti guman li ser rewaiya desthilata wî nemîne"⁸.

Em bawer dikin ku sedemeka din heye, ew jî ewe ku hin serwerên Kurdan ji berê da ji jiyana dewlemendî, comerdî û rûmetdar hezdikirin. Di vî warî da nimûne gelek pirin. Yek ji wan ewe ku bi çi şêwazê astbilind bajarê Akbatana (Amedan, Hemedan), paytextê Madan, di heyama padîşahê yekem *Deyako*, avakirine û ketina Madan nav jiyana dewlemendiyê di heyama padîşahê dawî *Ezdehak* da ku Farisan ew ji holê rakirin. Û di pey ra çawa padîşahê *Dewleta Dostikî* (merwanî) *Nesir El-Dewle* û derdora wî ketibûn jiyana dewlemendî û rijandina diravan û wisa Turkên Selcoqî ew ji holê rakirin.

Di rastiye da ev taybetmendî di kesayetiya kurdî da yek ji taybetmendiyan neyînî ye û piraniya caran bûye sedema peydabûna dijberî, kefteleft, têkçûnan û dagîrkirina Kurdistanê. Me ev taybetmendî di pirtûka xwe da "**Kesayetiya Kurdî: Lêkolîneka Civaknasî**" şîrove kiriye.

Çarşembe, 06.05.2015

Jêder

¹ Wilhelm Gernut, Horî, rûpel 64.

² Dr. Îmam Ebdulfettah Îmam: Zordar, rûpel 29. Wilhelm Gernut, Horî, rûpel 76. Tewfîq Sulaiman, lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyayê ya kevin, rûpel 277.

³ Wilhelm Gernut, Horî, rûpel 70 -73.

⁴ Fadil Ebdulwahid Eli, Ji Somer ta bi Tewratê, rûpel 158.

⁵ Ebdulhemid Zayed, rojhilata hemdem, rûpel 473.

⁶ Fadil Ebdulwahid Eli, Ji Somer ta bi Tewratê, rûpel 158.

⁷ Fadil Ebdulwahid Eli, Ji Somer ta bi Tewratê, rûpel 158.

⁸ Wilhelm Gernut, Horî, rûpel 73.